Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1251 | 26-Sibat-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

2025: Di zanistî û teknolojiyê de gavên nû

Navenda Nûçeyan

Sala 2025'an di zanistî û teknolojiyê de dibe ku bibe saleke diyarker. Ji sirên mejiyê mirovan heta bi sira madeya tarî bi van projeyan re tê xwestin, hem jiyana mirovan bê başkirin hem jî aliyên nayên zanîn ên gerdûnê bê keşifkirin.

Projeyên sereke yên ku wê siberoja teknolojî û zanistê diyar bike û armancên wan bi vî rengî ne:

Danîna nexşeya genetîk a mejiyê mirovan

Danîna nexşeya genetîk a mejiyê mirovan bi yekbûna qadên genetîk û zanista rehikan re ber bi dawiya sedsala 20'an berfireh bû. Piştî ku Projeya Genomê Mirov (HGP) sala 2003'an temam bû, di lêkolînên biyomedîkal de bû kêliyeke diyarker û ji bo fêhmkirina avaniya genetîk a mejî rêyên nû diyar kir. Projeya Human Brain ji aliyê Komîsyona Ewropayê ve sala 2013'an hate destpêkirin û ji bo fêhmkirina avaniya tevlîhev a mejî bû hewldaneke welê ku bi bikaranîna mejiyê çêkirî û teknolojiyên daneyê mezin derkete pêş.

Proje ji bo fêhmkirina şîfreyên genetîk ên mejî algorîtmayên mejiyê çêkirî û teknîkên diyarkirina nexşeya genetîk bi kar tîne. Tevnên rehikan û têkiliyên genetîk ên navbera herêmên cuda yên mejî xala diyarker a vî karî ye. Her wiha lêkolînkirina koka genetîk a nexweşiyên norolojîk ên weke Alzheimer, Parkinson û Otizmê hewl tê dayin rêbazên dermankirinê bê afirandin. Bi sala 2025'an re armanc ew e ku hewldanên ji bo danîna nexşeya genetîk a mejî û ahengiya van agahiyan li rêbazên tedawiya şexsê bê temamkirin.

Rê û rêbaza hilberîna enerjiyê ji fezayê

Fikrê hilberîna enerjiyê ji fezayê di salên navîn ên sedsala 20'î de weke çîrokeke zanistî hatibe dîtin jî di sedsala 21'ê de bû armanceke rasteqîn. Konsepta, li şûna wergirtina enerjiya rojê ji ser rûyê erdê hilberîna wê li fezayê û ragihandina vê enerjiyê bêyî qeblo ji cîhanê re, bi karên saziyên mîna NASA û Ajansa Fezayî ya Ewropayê kete rojevê. RESPONDET projeyeke ku dixwaze vê teknolojiyê bi rêbaza enerjiya dikare nû bibe re bixe nava ahengiyê.

Malzemeyên zindî yên ku dikarin xwe sererast bikin

Fikrê malzemeyên dikarin xwe nû bikin, bi sûdwergirtina ji hunera xwenûkirinê ya xwezayê di salên 1990'î de destpê kir. Karê destpêkê li ser polîman û malzemeyên weke beton destpê kiribe jî lêkolînên li ser bikaranîna organîzmayên zindî di deh salên dawî de zêde bûn. Projeya AM-IMATE hewldaneke pêşeng e ku materyalên biyolojîk ên mîna kuvarkan ji bo afirandina avaniyên nûkirî bi kar tîne.

Di çarçoveya projeyê de bi bikaranîna mîselyûmê re ku avaniyên kokê yên kuvarkan e, malzemeyên avaniyê yên dikarin nû bibin û xwe nû û sererast bikin, têne afirandin. Ev malzeme li derdora avahiyan, mobîlya û ambalajê li qadên cuda dikare bê bikaranîn. Armanc ew e ku heta sala 2025'an ev malzeme pêşkêşî qada bazirganiyê bê kirin û di sektora lêkirina avahiyan de şoreşekê biafirîne.

Di parastina mozan de nêzîkatiya teknolojîk

Kêmbûna populasyona mozan di salên 2000'î de veguherî pirsgirêke welê ku bala zanyarên hawîrdorê kişand. Ev rewş li ser hevsengiya ekosîstemê û hilberîna çandiniyê bû gefeke cidî. Projeya B-GOOD ji bo başkirina tenduristiya mozan bû hewldanek ku teknolojî û analîtîka daneyan gihand hev.

Daneyên li ser germahî, nêm, deng û liv û tevgera mozan a li kewaran, bi algorîtmayên mejiyê çêkirî tê nirxandin. Mêşvan jî bi sala van daneyan li ser rewşa tenduristiyê ya kewaran dibin xwedî agahî û destwerdana pêwîst jî dikarin di dema xwe de bikin.

Armanc ew e ku di sala 2025'an de populasyona mozan bê parastin û hilberîna çandiniyê bê dewamkirin.

Bajarên hîn kes û domdar

Domdariya bajaran ji nîvê duyemîn ê sedsala 20'î û pê ve bû xaleke girîng a tevgerên hawîrdorê. Di salên 2000'î de jî tekonolojiyên avahiya kesk û plansaziya bajarê ekolojîk navdar bû. Projeya CRAF projeyeke nûbûyî ye ku nêzîkatiyeke li tevlîkirina civakê û hunerê ya li veguherîna ekolojîk a bajaran nîşan dide.

Proje xwedî wan armancan e ku li bajaran qadên kesk bêne zêdekirin, rêyên bîsîkletan bêne zêdekirin û avahî bi berhemdariya enerjiyê bêne avakirin. Hunermend û civakên xwecihî hevkariyê dikin û modelên bajaran ên domdar ava dikin.

CRAFT ji xwe re dike armanc ku sala 2025'an domdariay hawirdorî ya bajaran û avakirina qadên hîn jiyanî pêk bîne.

Keşifkirina elementeke nû

Keşifkirina elementên giran ên super ji salên navîn ên sedsala 20'î û pê ve bû parçeyekî girîng ji lêkolînên nukleer fîzîkê. Elementên dawî yên li tabloya periyodîk li qada laboratûwarê hatine sentezkirin û her yek ji wan li gel ku temenê xwe kurt jî be li qada fîzîka atomê agahiyên girîng bi xwe re aniye.

Keşfikirina elementeke nû ya super giran, wê bi bikaranîna amûra bilezkirina parçikan û cîhazên pîvandinê yên hesas pêk were. Taybetmendiyên avanî yên van elementan li qadên weke enerjiya nukleerê û avakirina malzemeyên nû dikare gavên girîng bide avêtin. Di sala 2025'an de bi keşifkirina vê elementê re tê xwestin, tabloya periyodîk û feraseta fîzîkê ya binê atomê bê kûrkirin.

Sira madeya tarî û enerjiya tarî

Pênaseyên madeya tarî û enerjiya tarî di salên navîn ên sedsala 20'î de hatin ragihandin. Lê belê karên cidî yên destpêkê yên ji bo fêhmkirina van hêmanên nepen, di salên 2000'î de destpê kirin. Teleskopa Fezayê ya Nancy Grace Roman û tecrûbeya weke XENON, dixwaze li vê qadê gavên girîng biavêjin.

Diyarkirina nexşeya belavbûna madeya tarî û pîvandina bandora enerjiya tarî li ser berfirehbûna gerdûnê ji armancên bingehîn ên van projeyan e. Teleskopên pêşketî û dedektorên binê erdê di van lêkolînan de bi roleke girîng radibin.

Sala 2025'an têkildarî madeya tarî û enerjiya tarî de dibe ku agahiyên şênber pêşkêş bike. Ev agahî jî ji bo fêhmkirina avaniya bingehîn a gerdûnê û paşeroja wê di asta krîtîk de girîng e.

Di tipê de gavên nû: Crispr û şoreşa genetic

CRISPR (Clustered Regularly Interspaced Short Palindromic Repeats) ku tekonolojiya birêkûpêkkirina gen e, di sala 2012'an de bi pêşengiya Jennifer Doudna û Emmanuelle Charpentier ji cîhana zanistiyê re hate nasandin. Ev rêbaz bi sûdwergirtina ji sîstema xweparastinê ya xwezayî ya bakteriyan hate afirandin û kir ku deverên spesîfîk ên li DNA'yê bi rengekî hesas bêne birêkûpêkkirin. Di sala 2020'î de Doudna û Charpentier, ji ber karên xwe yên li ser CRISPR'ê hêjayî Xelata Kîmyayê ya Nobelê hatin dîtin. Ji ber ku ev teknolojî di dermankirina nexweşiyên genetîk de dikare şoreşeke gengaz pêk bîne, gelekî bal kişand.

FERHENGA BIWÊJAN

Xelata şivên cûnek benîşt e/ xelata şivên cûnek benik e:
- Xelata min jî li gorî min e; evqas ji destê min hat.
(Bi qasî ku mirov di devê xwe de bicû jê re tê gotin cûn, ango parçeyek)

Xelata zarokan şûtika sersibehiyê ye:
- Xelata wî li gorî wî ye; xelata zarokan piçûk e.
(Di sersibehiya bûkê de şûtik ji bo zarokan didan. Kemberek e piçûk e ji benikan dihonin)

LI SER LAYÎQBÛNÊ

Benîştê qanikan li devê canikan:
- Tiştên baş layîqî kesên baş in.
(Peyva "camêr" ji bo mêran, peyva "canik" ji bo jinan tê gotin)

Nanê ce layîqî nîskê ye:
- Tişta nebaş, yan jî kesê nebaş, **layîqî ya nebaş e:**
Xwedê çiya dibîne, berfê lê dibarîne.
- Dema du tişt, yan du kes li gorî hev bin hingê gê gotin.

Xwedê serî dibîne, kum li ser datîne:
- Bi heman wateyê.
Xwedê serî dibîne kum lê datîne:
- Bi heman wateyê.

LI SER NEWEKHEVIYÊ

Cûmê benîşt, şeh û neynik para wê, rîx û tepik para min:
- Tiştên baş ji wê re dikevin, yên nebaş ji min re.

Çêlekê didoşe Xatê, to dixwe Fatê:
- Dema yek dixebite û hin din ji keda wî dixwin û xwediyê kedê xwe dixeyidîne, hingê jê re dibêjin.

Dest dike dev dixwe:
- Bi heman wateyê.
Dinya penîr e; yek dibire yek lê dinêre
- Hin dikin hin dixwin; hin rewşa wan baş e, hin belengaz in.

Hin dikin hin dixwin:
- Bi heman wateyê.

Ker dike hesp dixwin:
- Hin dixebitin yên din jî ji xebata wan sûdê digirin.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

Bi kamîreya Hemza Sêvo

'Şoreşa Rojava bi fikir û felsefeya Rêber Apo bi ser dikeve'

Endama Kongra Star a bajarê Amûdê Şeha Seyîd diyar kir ku şoreşa Rojava bi fikir û felsefeya Rêberê Gelan Abdullah Ocalan bi ser dikeve û wiha got: "Dem dema azadiya fîzîkî ya Rêber Apo ye."**R-2**

'Em pir bi şens bûn ku me ronahiya rojê dît û pêre jiyan kir'

Welatiyê bi navê Elî Xilko diyar kir ku dîtina Rêber Apo ji bo wî derbaskirina astengiyên jiyanê bû û wiha got "Tevî ku Rêber Apo bi hebûna xwe ya fîzîkî ne di nav me de ye, lê bi parêzname û ramanên xwe roja me ronî dike".**R-6**

'Çeka me hunera me ye'



Endamê Koma Berxwedan û Hunermendê kurd hozan Kawa diyar kir ku pêwîst e her hunermendek rihê Bavê Teyar ê serhildêr bingeh bigire û wiha got: "Berxwedana Bendava Tişrînê bi serê xwe hunereke dîrokî ye."**R-7**

'Xeteriya Mezin Şerê Taybet e'

Rojnamevan Melevan Resûl diyar kir ku Şerê Taybet ê ku niha li Rojavayê Kurdistanê tê meşandin pir dijwar û xeter e. Ji bo li hemberî van lîstokan rê bê girtin, pêwîst e rojnamevan bi qasî berpirsyartiya xwe ya exlaqî û netewî tevbigerin.**R-5**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1251 | 26-Sibat-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

JI EFRÎNÊ TA BENDAVA ŞEHÎDAN ŞERVANÊ HEQÎQETÊ; EGÎD ROJ

Şervanê heqîqetê Egîd Roj di temenekî biçûk de, bi pêşketina Şoreşa Rojava re tevlî nav xebatên şoreşê bû û demekê di nav xebatên parastinê de cih girt. Piştre tevlî xebatên çapemeniyê bû û weke endamekî Ragihandina Azad salên dirêj kar meşand. Egîd Roj, bi dirêjahiya şerên li Efrîn, Şehba û Helebê kedeke mezin da. Herî dawî li Bendava Tişrînê, dema xwepêşandanên sivîlan dişopand, hate hedefgirtin. Rêheval Egîd kevneşopiya Ragihandina Azad di xwe de jiyanî kiribû û yek kêliyê ji şopandina heqîqetê dûr neket.**R-4**

Fûad Umer: Xebata diplomatîk mafê kurdan li ser asta cîhanî diparêze

Endamê Rêveberiya Diplomasî ya PYD'ê li Ewropayê, Fûad Umer diyar kir ku bi dirêjahiya dîrokê re, dijminên kurdan di warê navnetewî û diplomasî de gelek mijar dixistin xizmeta xwe, kurd jî bê rol bûn û got: "Îro kurd xebata diblomasî dikin, ev xebat jî maf û hebûna gelê kurd li ser asta navnetewî diparêze."**R-3**

Ji bo jinê çareserî çi ye? — Nehîr pale — R-2
Li Sûriyê çarserî xweseriye! — Dilyar Cizîrî — R-4
Li şûna Baas'ê rejîma HTŞ tê avakirin — Zekî Bedran — R-5

‘Şoreşa Rojava bi fikir û felsefeya Rêber Apo bi ser dikeve’

Endama Kongra Star a bajarê Amûdê Şeha Seyîd diyar kir ku şoreşa Rojava bi fikir û felsefeya Rêberê Gelan Abdullah Ocalan bi ser dikeve û wiha got: “Dem dema azadiya fîzîkî ya Rêber Apo ye.”

Dilîn Ehmed/Qamişlo

Derbarê girîngiya fikrê Rêber Apo ji bo çareserkirina pirsgirêkên herêmê û giştî Rojhilata Navîn, endama Kongra Star ya bajarê Amûdê Şeha Seyîd ji rojnameya me re axivî.

Şeha Seyîd diyar kir ku dem dema azadiya Fîzîkî ya Rêber Apo ye û wiha domand: “Ti kes nikare înkar bike ku bi saya fikir û felsefeya Rêber Apo û xwîna şehîdan, gelê herêmê bi hev re bi azadî û wek hevî dijîn. Çimkî fikrekî azadîxwaze ne berjewendiye. Jixwe armanca komploya navdewletî ya dijî Rêbertiya me ev bû ku, gelê kurd li ser rûyê cîhan bê par bikin, bi taybetî dewleta tirk ya dagîrker. Lewra ew ne tenê dijî azadiya gela ye, ew dijî jiyaneke wekhev û mirovatiyê ye. Gelê herêmê jî bi têkoşîn û berxwedana xwe armanca komplo têk birin. Ji bo vê jî em dibêjin di demeke wiha de gelê herêmê bi taybetî gelê Kurd, pêwîstiya wan bi azadiya Rêbertiyê heye, çimkî ew kilîta çareseriyê ye. Êdî bûye dema ku em Rêberê xwe di nav xwe de bibînin, Rêberê ku gel ji qirkirina dijminan azad kirî, cihê wî ne zîndan ne.”

‘Bi felsefeya te em azadi n, em ê jî bi têkoşîna xwe te azad bikin’

Şeha Seyîd wiha domand: “Em wekî jin ti carî dîlgirtina Rêber Abdullah Ocalan qebûl nakin û heta Rêber Apo azad nebe em ê li qadan bin. Rêber Apo ji destpêkê ve ji bo azadiya gelê Kurd têkoşîn dike. Em jî deyndarê vê têkoşînê ne, bi taybetî em jin. Lewra ti kesî ji bilî Rêbertiya me, jin azad nekirî û mafê wê neparastî. Ji bo wê divê em jin kar û xebatên xwe zêdetir xurt bikin, divê em xwediyê ku me azad kirî em wî azad bikin.”

‘Bi têkoşîna xwe em ê planên dijmin têk bibin’

Endama Kongra Star ya bajarê Amûdê Şeha Seyîd ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, bang li tevayîya gelê azadîxwaz kir ku bi têkoşîna xwe planên dijmin têk bibin û axaftina xwe

wiha qdand: “Dewleta tirk ya dagîrker çi dike bila bike û bila ew jî bigihêje vê baweriyê ku, êdî li tevayîa cîhanê, dengê gelê kurd bilinde. Em wek jin heta azadiya Rêberê xwe, emê pêşengê şoreş û berxwedanê bin. Divê gelê herêmê armanca dijmin ya qirkirina gel, bi kar û xebatên xwe têk bibin û derfetê nedin ti kesî wekheviya dinavbera gel de, xerab bikin.”

Bi koperatîfa Demsal keda hevpar a jinan berhemdar dibe

Navenda Nûçeyan

Bi kooperatîfa Demsal a Komîteya Aborî ya Kongra Star di sala 2018’an de da destpêkirin, keda hevpar a jinan berhemdar dibe.

Komîteya Aborî ya Kongra Star ji bo vekirina projeyên aborî ku bi riya wan derfetê kar ji jinan re peyda bike xebat dike. Di heman demê de bi armanca ku çanda kooperatîfan di nava civakê de were belavkirin û pêşxistina aboriya civakê ber bi civakek azad û demokratîk ve kar û xebat didin meşandin. Kooperatîfa Demsal ku di sala 2018’an de hatiye avakirin ku Îro di hundirê vê projeyê de gelek beşên xweş û zengîn dihewîne. Yek j wan projeyan jî Xwarîngeha Înana, çêkirina nanê sêlê, çêkirina made û xwarinên demsalî ye.

Di vê kooperatîfê de 10 jin kar û xebat didin meşandin. Ji seat 8:00 heya 15:00 kar û xebatên xwe bi rihekî hevpar berdewam dikin.

Çima Demsal?

Rêvebera kooperatîfa Demsal Nisrîn Şêxo tekez kir ku jin rolek mezin di hemû aliyên jiyanê de dilîzin û wiha anî ziman: “Ên ku aboriya civakê bi rengekî saxlem wekhev û rast bi pêş bixin jin in. Jinan di civaka xwezayî de aboriyê bi pêş dixist û civaka xwe birêve dibirin. Em dibînin ku bi pêşengiya jinan wê sîstema kooperatîfan were pêşxistin. Ji ber ku ev sîstem di dîrokê de ji aliyê jinan ve dihat birêvebirin. Navê Demsal jî li vê kooperatîfê hat kirin ji ber ku di salê de 4 demên salê hene, her demek jê jî karekî wê heye lewma ev kooperatîf çi kar di van deman de hebe

dike. Niha dem dema çêkirina hemû madeyên xwarinê yên malan e. Mireba sêva, mireba kundir, mireba tirî, mireba bacanên reş, mekdûs, milûxiyê, hişkirina bacanên reş, penêr, mihemera û ava bacanan hemû tên amadekirin lewma di kîjan demê de ji werzên salê kar hebe em çêdikin. Heyva pêşiya me jî em ê dest bi amadekirina pêdiviyên sersalê, şîraniyên benî û bastêqan bikin.”

Hewl didin ji krîzên heyî re bibin bersiv

Nisrîn Şêxo di berdewama axaftina xwe de wiha got: “Di hundirê koperatîfa Demsal de 10 jin bi hezkirin, rihekî hevpar û alîkarî karên xwe didin meşandin. Projeya Demsal xwedî çend beşan e. Yek jê xwaringeha Înana ye. Yek jî çêkirina nanê sêlê ye, wekî din jî amadekirina madeyên demsalan û şûştina xalîçe ye. Beşên ku di hundirê koperatîfê de li gorî pêwîstiya bajarê Hesekê hatiye çêkirin mînaka wê jî beşa şûştina xalîçe ye ji ber ku xelkên Bajarê Hesekê zehmetiya avê dikşînin û derfetên wan tune xalîçeyên xwe bişûn, ji ber wê yekê me pêwistî dît ku em bibin alîkar vê beşê vekin. Bihayê karê me ji yê derve kêmtir e heya ku ji me tê em hewl didin alîkariya civaka xwe bikin.”

‘Em dixwazin jin di qada aborî de xweser bin’

Nisrîn Şêxo da zanîn ku xwaringeha Înana di pêşxistina kooperatîfa Demsal de esas e û wiha anî ziman: “Înana Jinek xwedawend e bi navê xwedawenda evîn û şer jî tê nasîn. Wê di warê jiyan û mirinê de rêveberî dikir, zagon, destûrên jiyanê keşif dikir lewma me xwest navê Înana li xwaringeha xwe bikin ji ber ku li xwaringeha me hemû xwarinên gelerî bi destên jinan amade dibin û tên pêşkêşkirin. Karê xwaringehê li gorî daxwazan tê amadekirin. Em dixwazin jin di qada aborî de xweser bin, bi hev re bi rihekî kar bikin ev yek jî bi riya kooperatîfan pêk tê. Her dem karê bi hev re serkeftinê tîne û bi riya kooperatîfan pirsgirêkên aborî çareser dibin.”

Nisrîn Şêxo di dawiya axaftina xwe de wiha got:“Firoşgeha me jî heye, hemû berhemên ku li vê derê tên çêkirin di riya firoşgeha me tên firotin. Em dixwazin kooperatîfên bi vî rengî zêde bibin û jin di vî karî de xwe bi pêş bixin, rola xwe di qada aborî de bi rengekî xurtir bilîzin.”

‘Hevgirtina jinan kooperatîfa Demsal serkeftî kir’

Celîla Hisên yek ji jinên avakerên kooperatîfa Demsal e tekez kir ku hevkarî û hezkirina jinan ji hev re projeya Demsal serkeftî kiriye û wiha axaftina xwe domand: “Ez yek ji jinên destpêkê me. Min cih di vê kooperatîfê de girt, bi rastî jî karekî pîroz e. Îro 10 jin bi hev re dibin alîkar, bi rihekî hevpar kar û xebatên xwe didin meşandin. Tiştên herî girîng û esas di serkeftina vê projeyê de ruhê hevpar ê jinan e. Bi rastî em rojane tên kar niha em ava îsotan çêdikin, milûxiyê hişk dikin û mireba çêdikin. Yanî her tiştek wextê wê heye em jî karê xwe li gorî demê dikin. Jinên ku di vê kooperatîfê de cih digrin ji pêkhateyên Kurd û Ereb in. Weke jinek armanca min ji vî karî ew e ku di qada aborî de xweseriya min hebe, xwedî li xwe û malbata xwe derkevim. Kar pir xweş e û karê me ne tiştekî dûrî jinan e ji ber ku hemû girêdayî xwezayê ne. Em dixwazin karê me berfirehtir bibe .”

‘Ji bo berfirehiya vê projeyê em ê bêtir ked bidin’

Celîla Hisên axaftina xwe wiha bi dawî kir:“Hemû tiştên ku di vê kooperatîfê de tên çêkirin bi jinan ve girêdayî ne. Mînak çêkirina nanê sêlê, yek ji çanda jinan a kevnar e lewma em vî karî li ser xwe zehmet nabînin û bi hezkirin didin meşandin. Di destpêka avakirina kooperatîfê de ewqas beş tunebûn lê ji ber ku serkeftî derbas bû pêdivî hat dîtin were berfirehkirin. Dîsa jî ji bo berfirehiya vê projeyê em ê bêtir ked bidin.”

Ji Pênûsa Jin

Ji bo jinê çareserî çi ye?

Nehîr Pale

Ji bo jin bighîje asta pirsgirêkên xwe çareser bike û bibe xwedî îrade ew ê siyasetê hilbijêre û têbikoşe. Têkoşîn nayê wateya dijminahî, qebûlnekirina kevnpereştiyan an jî li hemberî ol derketin e. Têkoşîn tê wateya jin dest bi lêgerîna heqîqetê bike. Heqîqet jî çareserî ye. Sîstema baviksalarî ya dagirker destûr nade ku jin, ciwan an jî ji civakê kesek li beramberî zagonên wê têkeve nava nakokiyan û dest bi lêgerîna heqîqetê bike. Ji civakê kî dest bi lêgerîna heqîqet û çareseriyê bike sîstema dagirker wê wan sûcdar bike û bi rêbazên herî qirêj wan bide kuştin. Derbarê sîstemê de ji civakê nabe ku kesek bipirse û hewl bide fêm bike, an jî nêrînên xwe bîne ziman. Ji bo iqtîdar hilneweşe lêpirsîn kirin, nîqaş kirin, nêrîn dayîn hemû xeter in. Ji ber vê yekê sîfeta imprator, qiral û serok dikeve şûna xwedê û kesek nikare van sîfetan lêpirsîn bike. Civak bi tevayî wê serê xwe li beramberî van sîfetan bitewîne û hewl bide xwe pê bide qebûlkirin. Ev yek bû sedema ku civak ji siyasetê dûrbikeve û heyanî serê xwe têkeve nava heriya koletiyê de.

Di vê rewşê de wê rewşa jinê çi be? Hem sîstem hem mêr koletiyê li ser jinê ferz dike. Jinê di mejî û dilê wê de parçe-parçe dikin û wê bê hêz dikin. Êdî mejiyê wê tevlîhev dibe, nizane çawa bijî, tenê fêr bûye li beramberî bûyerên xemgîn bigrî û di şahiyan de bikene. Eger ew bixwaze yan na, ew neçare li gorî ku civak jê dixwaze tevbigere. Jin her tiştî bê îrade xwe dike. Jina ku hewl dide li gorî difikire û hîsdike tevbigere ew jin li gel civakê aqilê wê kême yan jî bê exlaq e. Êdî ew jin di civaka xwe de nayê qebûlkirin û cî jêre nîne. Malbata wê jî jê fedî dikin û dixwazin bi awayekî xwe jê xilas bikin.

Em vegerin pirsa xwe; li beramberî sîstema baviksalarî û civaka zayendeperest çareserî çi ye? Ji bo jinê çareserî tenê di siyasetê de ye. Gava yekemîn ji bo jin dest bi siyasetê bike wê xwe birêxistin bike, gava duyemîn xwe perwerde bike, wê dîrokê bixwîne, da ku bikaribe xwe ji bermahiyên sîstemê rizgar bike. Jina ku dixwaze bibe siyasetmedar nabe ku di nîvê rê de gav paşve bavêje û bibe esîra sîstemê.

Gerîlaya jin a ku dest bi têkoşînê kiriye ji bo nekeve destê dijminê xwe, bombeya xwe bi xwe de diteqîne, jina siyasetmedar dema ku hukmê darvekirinê lê dibirin, ew radest nabe û gav paşve navêje. Jina dest bi têkoşînê kiriye heyanî kêliya dawiyê di jiyana xwe de wê li ber xwe bide.

Mêr ji pirsgirêkên jinê re çareseriyê nabîne, heyanî ji destê mêr tê hewl dide jinê di koletiyê de bifetisîne. Di dîroka ku sîstema baviksalarî nivîsiye pesna jina kole tê dayîn, behsa jina xizmetkar, dansos û kole tê kirin. Jina ku têdikoşe di dîrokê de behsa wê nayê kirin. Ji ber vê yekê jin wê li ser bingehê azadî, wekhevî û edaletê pirsgirêkên xwe bixwe çareser bike.

‘Çeka me hunera me ye’

Endamê Koma Berxwedan û Hunermendê kurd hozan Kawa diyar kir ku pêwîst e her hunermendek rihê Bavê Teyar ê serhildêr bingeh bigire û wiha got: “Berxwedana Bendava Tişrînê bi serê xwe hunereke dîrokî ye.”

Zindan Şoreş/Qamişlo

Bavê Teyar bi navê rasteqîn Cuma Xelîl şanoger û lîstikvanekî ji Rojavayê Kurdistanê bû. Di sala 2001’an de koma Bavê Teyar li bajarê Qamişlo yê Rojavayê Kurdistanê hate damezrandin. Keç û birayekî xwe Tevlî Tevgera Azadiyê dibin. Di êrîşekî dewleta Tirk a dagirker de li Bendava Tişrînê, tevlî kerwanê nemiran dibe. Derbarê jiyan û berxwedana Bavê Teyar (Cuma Xelîl) de, hunermend û stranbêjê Kurd hozan Kawa ji rojnameya me re axivî:

‘Dibe ku em bi fîzîkî ne li gel berxwederên bendavê bin, lê em kêlî bi kelî bi dil li gel wan in’

Endamê Koma Berxwedan û Hunermendê Kurd hozan Kawa berxwedana Bendava Tişrînê ya dîrokî silav kir û wiha got: “Em destpêkê berxwedêr û şervanên di çeperên azadiyê ku niha li Bendava Tişrînê û kudera Kurdistanê de bin û li ber xwe didin bi dil û can silav dikin. Berxwedana wan hêzê dide xebat û keda me. Serdem çarenûsa gelan didin diyar kirin. Ev serdema ku em têde dijîn jî, serdema 21’emîn, serdema çarenûsa gelê Kurd dê bide diyarkirin. Taybet li Rojavayê Kurdistanê bi şer û têkoşîna xwe dersa mirovahiyê dan cîhanê. Ji ber ku hêza DAIŞ’ê têk bir, niha jî li

hemberî çeteyên ku di bin sîwana DAIŞ’ê de hatine birêxistinkirin berxwedanek bêhempa didin meşandin. Keç û xortên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi berxwedana xwe rûmeta mirovahiyê diparêzin. Bi rastî jî navê nû ya Bendava Tişrînê bi hêsanî nebû Bendava Şehîdan. Gelê me yê li wir çalakiya mertalên zindî didomîne, ji mirinê re meydan dixwûnin. Ev gel bi wê peyama vekirî dide raya giştî “Çeka me, vîna me ye.” Cangoriyên azadiyê nirxên wî gelî ne. Parastina Rojavayê Kurdistanê azadiya hemû beşên Kurdistanê dê mîsoger bike. Mijara herî bingehîn jî, tevlîbûn û piştgiriya hunermandan ji wê berxwedanê re ye. Hunermend pêşengên civakê ne û hestên hunermendan asta pêşxistina berxwedanê diyar dikin. Xuya bû ku hêz û vîna me divê teqez serkeftinê mîsoger bike. Berxwedana têye raberkirin bi cîhanê da gotin: “Kurd mafdar in, divê mafên wan bên dayîn”. Lê welatên hevalbendên Kurdan ên ku piştgirî didin doza wan, ev tenê di gotinê de hiştin e. Ev bertekên wan di raya giştî de zêde deng nade. Hunermend bi têkoşîna gel re, gel bi xebatên hûnerî re xortir dibe. Gel û şervan weke av û masî ne, nikarin bê hev jiyan bikin”.

‘Hunermend divê weke Bavê Teyar berxwedêr bin’

Hozan Kawa şanogerê mezin Bavê Teyar ê ku di berxwedana Bendava Tişrînê de şehîd bûbû bi bîr anî û wiha axaftina xwe dewam kir: “Bavê Teyar bi navê din Cuma Xelîl bi rastî jî nişaneya şoreşgertiya hunermendan bû. Ji ber ku Bavê Teyar bi şano û berhemên xwe yên hunerî civakek perwerde kir û nifşek mezin kir. Bavê Teyar ji tevahiya cîhanê re isbat kir ku hunermend ne tenê şano dileyize yan jî stranan dibêjê, hunermend dema ku bê xwestin şoreşger e û dema bê xwestin jî şervan e. Helwest û kelecana Bavê Teyar a li hemberî dijmin a li qada berxwedanê, helwesta hunermendên rast ên civakê bû. Bavê Teyar di kesayeta xwe de hestên welatparêziyê xwedî dikir û Kurdistanî bû. Naskirina min ya Cuma Xelîl di hatina wî ya Ewropa ji bona pêşkêşkirina şanoyan de çêbû. Demek kurt be jî, naskirina Bavê Teyar ji bona me cihê serbilîndî û kêfxweşiyê bû. Lê ji bona mirov kesayetên weke Bavê Teyar pênase bike, tenê bi fîzîkî dîtin têrê nake. Hunermendên weke hozan Mizgîn, Hozan Serhed û Yekta Herekol û herî dawiyê jî Bavê Teyar hêza hunermandên

Kurd nîşanî hemû gelên cîhanê kirin. Kesayeta Cuma Xelîl bi me da fêmkirin ku çawa em dikarin deynê vî gelê bidin û bû mamosteyê me yê nemir. Bi gotina xwe ya navdar “Me kefenê mirinê çirandiye” kêliyên ku dê şehadetê jiyan bike, dike kêliyên serkeftinê. Rihê Mazlûm Doxan û Kemal Pîr dide zindîkirin. Bavê Teyar bangekî mezin ji bona hunermendên ku dijî şoreşê kar dikin û dijminê xwe re koletiyê dikin re dike. Pêwîste ev banga Bavê Teyar bibe banga heqîqetê ji bona hemû hunermendên civakê. Pêwîste em hunermendê vî gelê tenê nehêlin û guh bidin dengê rastiyê. Dem ne dereng e, roj roja me ye û em pêwîste wê demê têr û tijî bi kar bînin. Dilê me hemûyan ji bona Bendava Şehîdan lê dide. Em dûr in lê dilê me nêz e. Lê demekê nêz de ji bona dîtîna Rojavayê Kurdistanê û berxwedana wê, em ê werin li wir bibînin.”

‘Pêwîste hunermend ne tenê bi stranan , bi hunera xwe xebatên cuda yên ji bo Kurdistanê bidin nîşandan’

Kawa diyar kir ku divê hunermend rola xwe di hemû qadên şoreşê de pêk bînin û wiha axaftina xwe bi dawî kir: “Pêwîste hunermend kêlî bi kêlî di nav tevgera şoreşê de bin û di her qadê de çi dikeve ser milê wan bikin. Divê hunermend dest ji berjewendiyên kesayetî berdin û bi rihê Bavê Teyaran têkoşîn bikin. Ev yek ji tevayî civakê û bi taybet ji hunermendan tê xwestin ku weke pêşengên civakê bi erkên xwe rabin û bigihêjin serkeftinê. Dîsa dubare bejna xwe li ber şehîdên Bendava Tişrînê ditewînim û ji berxwederên li hemberî dagirkeriyê re silavên germ disînim”.

‘Armanc derxistina bedewî, cihêrengî û hevgirtina gelan e’

Esma Mistefa/ Qamişlo

Hevserokê Desteya Çand û Hunerê a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Murhef Bedir diyar kir ku di berhemên wan yên hunerî yên dawî hemû pêkhateyên Sûriyê beşdar bûn û wiha got:: “Armanca me hevgirtina gelan e.”

Desteya Çand û Hunerê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi xebatên hunerî gelek gavên bi bandor avêtin. Herî dawî bi gelek pêkhateyên Sûriyê re kilîp û xebatên hunerî hatin amedekirin. Têkildarî van berheman Hevserokê Desteya Çand û Hunerê a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Murhef Bedir ji rojnameya me re axivî.

Bi hunerê peyamên aşîtiyê

Murhef di destpêkê de bal kişand ser girîngiya xebatên hunerî û çandî û wiha got: “Bê guman gelê Sûriyê di kirîza ku zêdetirî 14 salan dewam kiriye û hê jî didome, gelek êş û zehmetiyên ku nayên bilêvkirin kişandin. Helbet rola hunerê jî gelekî girînge. Bi xebatên hunerî em dikarin peyamên aşîtiyê û hezkirinê di nava civakên Sûriyê de bidin belavkirin. Çêkirina berhemên hunerî alîkarî û kurtkirina gelek peyamên aştiyê di nav gelê Sûriyê de ye. ji bo derbaskirina serdemên şerên ku Sûriyê di heyama borî de derbas kiriye her wiha ji bo ku diyaloga siyasî ku bibe bingeha avakirina Sûriyeke demokratîk.”

Sûriye bixemilîn in

Herwiha Murhef têkildarî naveroka her du berheman yên bi navê “Sûriyê bixemilîn in û çand û dîroka herêmê” de wiha got: “Bi taybet di vê pêvajoyê de li ser asta Sûriyê ji aliyê Desteya Çand û Hunera Bakur û Rojhilatê Sûriyê ve, du stran hatin amadekirin, ya yekem bi navê Sûriyê Bixemilînin e, ku armanca wê ew e ku hemû ziman û zaravayên ku li Sûriyê tên axaftin, weke ku di şahiya dawîbûna rewşa şer a piştî rûxandina rêjîma dîktator û vegera Sûriyê ya li ser bingeha hezkirin û hevrêziyê bigihîne hev.

`Çand û dîroka herêmê`

Di strana duyemîn de jî folklora çandî û dîroka herêmê bi peyvên folklorîk û xêzkirina şûnwarên arkeolojîk dinirxîne. Helbet ev stran ji aliyê Desteya Çandê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê û li Studyoya Şehîd Walat de hatiye amadekirin. Di vê klîpî de me xwest em zêdetir bal bikşînin ser çanda herêmê, her wiha ji ber zengînbûna herêmê û Sûriyê di aliyê dîrokî de, me xwest vê yekê bi awayekî hunerî li cihên dîrokî derxînin pêş.”

Armanc bedewî, cihêregî û hevgirtina gelan e

Murhef bal kişand ser beşdarbûna hemû pêkhateyan di van berheman de û axaftina xwe wiha qedand: “Hemû pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê beşdarî van stranan bûn û birrengiya ziman derket pêş pêkhateyên ku tê de beşdar bûne wiha bûn (erebî, kurdî, suryanî, ermenî, suweyda, Helebê û hemû deverên din). Di riya vê kilîpê re hevgirtina pêkhateyan hatiye raberkirin. Helbet ev yek jî nîşaneya pirrengiya çandan, ziman û mozaîka xweşik ya di Sûriyê de xwe parastiye. Em jî bi riya van berheman vê xweşikbûnê derxînin pêş. Armanca vê beşdariya berfireh ew e ku bedewiya Sûriyê, cihêrengî û hevgirtina wê derbixe holê û aliyên çandî û dîrokî yên hemû pêkhateyên herêmê ragihîn.”

‘Em pir bi şens bûn ku me ronahiya rojê dît û pêre jiyan kir’

Welatiyê bi navê Elî Xilko diyar kir ku dîtina Rêber Apo ji bo wî derbaskirina astengiyên jiyanê bû û wiha got “Tevî ku Rêber Apo bi hebûna xwe ya fîzîkî ne di nav me de ye, lê bi parêzname û ramanên xwe roja me ronî dike”.

Amara Baran/ Qamişlo

Dema Rêberê gelan Rêber Apo derbasî Sûriyê dibe, gelek welatparêz û azadîxwazên Kurdistanî derbasî cem Rêber Apo dibin. Rêber Apo gelek kesayetên civaka Kurd perwerde kir û ev kir xwedî zanebûn. Gelek kesên di pêkhate û olên cuda jî li gel Rêber Apo civîyan.

Di derheqê bîranînên ronahiya rojê Rêber Apo û pêşdîtinên Rêber Apo yên wê demê welatparêzê bajarê Dêrikê Elî Xilko ji rojnameya me re axivî.

‘Min bi riya hevalên xwe Tevgera Azadiyê naskir’

Elî Xilko yê ji bajarê Dêrikê û herêma koçeran bîranînên xwe yên li gel Rêber Apo vegotin û wiha dest bi axaftina xwe kir: “Em di sala 1996’an de em ji herêma koçeran derbasî bajarê Dêrikê bûn. Gundê me gundekî welatparêz û girêdayi nirxên azadiyê ne. Di heman salê de jî ez û hevalekî xwe yê bi navê Osman yê gundê Bane Qesrê, yê ku piştî demekê dema derbasî ciyayên azad bû û piştre şehîd bû me bi hevre alîkariya berhemên genim kom dikir. Dema ku me karê derbaskirina hevalan dikir û ji qada ciyan jî heval derbasî axa Rojava dikirin, wê demê me tevgera Azadiyê ji nêz ve naskir. Ji bona em alikariyê bigihînin hevalan

em çûn paytexta Sûriyê Şamê. Lê piştra em derbasî Libnanê bûn. Di wê komê de kesayatên li gel Rêber Apo man û piştre ji bona doza azadiyê xwe feda kirin jî hebûn”.

Sekna Rêbertî kir şêwazê jiyana xwe

Elî Xilko di vegotina kêliyên ku Rêbertî dîtine de wiha got: “Gel ji bo Rêber Apo bibîne, ji gelek bajarên Kurdistanê hatin û derbasî Akademiya Leşkerî ya Mahsum Korkemaz li Libnanê bibûn. Dema ku em li bendê bûn ku Rêber APO derbasî nava gel bibe, ji nişkîve carekê me meyzekir ku Rêbertî hat, wê gavê em pir kêfxweş bûn. Rêber Apo bi gel re civînek girêdayî pêvajoyê çêkir. Girseyeke mezin tevlî wê civînê bû. Wê demê welatparêzê bi navê Mihemed Ismayl pirsek li Rêber Apo kir û got: “Hûn çima demeke dirêj li vê derê man?” Rêber Apo bersiva wî da û got: “Tu hebe gel jî amade ye, tu nebe gel jî nîn e”.Ev dide xuyakirin ku Rêber Apo di kar û rêxistinkirina gel de çiqas cidî nêz dibû. Girêdanbûna me ya welat di wan deman de hîn xurttir dihate jiyan kirin. Wê demê civîna ku Rêber Apo birêve dibir 2 demijmêran berdewam kir. Hevalê Hemze (Hesen Bindal) jî di wê civînê de amade bû û li kêleka Rêber Apo di dîwanê de cîhê xwe digirt. Me li gel Rêber Apo komeke fûtbolê avakir û em leyistin. Çawa ku di fermîyetê de cidî nêz dibû, di hemû kar û xebatên jiyanî de jî wisa bû. Min nêzîkatiya Rêbertî ji xwere mînak girt û kir şêwazekî jiyana xwe ya rojan e. Dema civîn xilas bû em derbasî bin konan bûn, Rêber Apo di bin kon de rûniştî bû û nivîs dinîvîsand. Televizyon meyzedikir û saziyekî ragihandinê jî bi Rêber Apo re hevpeyvîn çêdikir. Di carekê de Rêber Apo 3 kar bihevre dimeşandin. Ev lezgînî û displîna karê wî bala hemû kesên li wir dikşand. Rêbertî di karên xwe de pir bi plansaz tevdigeriya. Ger wê demê civaka Rojavayê Kurdistanê ne hatiba perwerde kirin, dê şoreşa Rojavayê Kurdistanê têk çûba.”

‘Em çiqas kar û xebatê bikin, hîn em deyndarê Rêber Apo ne’

Elî Xilko da xuyakirin ku perwerdeya Rêber Apo bingeha şoreşê xurtirkir û wiha berdewam kir: “Di wê demê de, me kar û xebatên hevpar bi saya ramanê Rêber Apo dimeşandin û em fêrî wê yekê bûn. Me wê demê bi alîkariya komkirina nîskan ve, hewildan kir ku piştgirî bidin Tevgera Azadîyê. Wê demê gundê Hemze Begê yê dikeve herêma koçeran welatiyê bi navê Seîdê Îbrahîm me bi hev re berhemên ku hatine komkirin şandin. Em gundi hemû kom bûn ji bona alîkariyê bidin hev, ramanê Rêber Apo yê jiyana komînal em gelek dane fêrkirin. Pêşdîtinên Rêber Apo pir xurt bûn û di wê demê ev yek anî ser ziman û wiha got: “Dibe rojek were ez ne di nav we de bim, lê bi gotin û ramanên min hûnê xwe ava û birêxistin bikin û wê demê kar û xebatên xwe hûnê min bidin jiyan kirin. Lê dema we nekarî xwe ava bikin em ê bi hevre têk biçin.” Ev rojên ku Rêbertî qala wê dikir roja me ya îro ye.

Divê em Rêberê xwe baş fêmbikin û ramanên wî baş pêkbînin. Hêviya cîhanê tev Rêber Apo ye û bi gotineke wî aloziyên Rojhilata Navîn hemû wê çareser bibin. Dema hin heval perwerdeya leşkerî qedandin derbasî çiyayên azad bûn û di rê de şehîd bûn. Rêber Apo Fermandariya Navendî rexne kir û got: “Ev mirovin, ne kurê diya we ne, pêwîste ev heval ewlehiya wan hatiba parastin.” Ev jî ji me re dide xuyakirin ku jiyana mirovan li gel Rêber Apo çiqas bi wate ye û çiqas girîngî dide şervanên azadiyê. Rêbertî ji min re got tu xwe perwerde nekî, tu nikari peywendiyên xwe yên malbatî jî rêxistin bike û wê demê emê malbatekê di şoreşê de winda bikin. Heya herêmê me Tevgera Azadiyê naskirin me pir zehmetî kişand. Lê bi ramanê Rêber Apo weke gel me ev astengî jî derbas kirin û niha em di nav şoreşekî mezin de jiyan dikin.”

‘Ji bona fêmkirina Rêber Apo, pêwîste em wî bidin jiyan kirin’

Elî da diyarkirin ku gelek kesayetên şehîd bûne Rêberê gelan Rêber Apo nedîtibûn, lê ew bi çalakiyên xwe dan jiyankirin û wiha axaftina xwe qedand: “Piştî naskirina Tevger û Rêber Apo di nava malbata me de pir tevlîbûn û şehîd çêbûn. Em tevgera şehîdane û bi saya van şehîdan em li ser linga ne. Em ê Rêber Apo bi fîzîkî azad bikin. Azadiya Rêber Apo jî bi bilindkirina asta kar û xebatê ve girêdayî ye. Bi qedandina aloziyên Rojhilata Navîn û cîhanê di asta yekemîn de bi azadiya Rêber Apo ve girêdayi ye. Gelek qehraman û pêşengên doza azadiyê hebûn, lê Rêber Apo ne dîtibûn. Ji xwe Rêbertî jî dibêje “Pêwîst nake hûn min teqez bibînin, min bidin jiyan kirin.” Em pir bi şansbûn ku me ronahiya rojê dît û me pêre jiyan kir. Em ê heya dawiya temenê xwe bi ramanê Rêber Apo re jiyan bikin.”

Tevî kêmbûna nirxê dolar lê nirxên kelûpelan hîna bilind e

Dilovan Kêfo/Amûdê

Welatî û firoşkarên bajarê Amûdê diyar kirin ku tevî kêmbûna nirxê dolar, lê hîna jî bazirgan kelûpelan bi nirxekî bilind difroşin. Herwiha endamê Desteya Pêjiyanîyê ya bajarê Amûdê Mehmûd Ismaîl anî ziman ku ew rewşa bazarê dişopînin û got, “Bazirgan û firoşkarên ku li gorî xwe kelûpelan difroşin ew ê bên cezakirin.”

Aloziya ku li Sûriyê ewqas salan dirêj kir, rewşa jiyanî ya hemû welatiyên Sûriyê zehemt kir. Di heman demê de xizaniyeke mezin li Sûriyê pêk hat. Ev rewş heya niha jî tê jiyankirin. Herwiha piştî têkçûna rejîma Eseed hin ceza li ser Sûriyê hatin sivikirin û nirxê dolarê Emerîkî li hemberî lîreya Sûrî kêm bû. Lê bazirgan kelûpelan hîna jî bi nirxekî bilind difiroşin firoşkaran. Gel jî nerazîbûna xwe li hemberî nirxê bilindbûna kel û pelan nîşan didin û ji aliyê peywendîdar daxwaz dikin ku rê li pêşiya vê yekê bigirin.

Derbarê bilindbûna buhayên kelûpelan yek ji welatiyên bajarê Amûdê yê bi navê Mehmûd Xizlanî, herwiha firoşkarê cil û bergan Welîd Zilfo û endamê Desteya Pêjiyanîyê ya bajarê Amûdê Mehmûd Ismaîl ji rojnameya me re axivîn.

Welatiyê bi nave Mehmûd Xizlanî diyar kir ku rewşa aborî û jiyanî bi hemû awayên xwe zehmete û wiha got: “Li Sûriyê bi taybet li Bakur û Rojhilatê Sûriyê rewşa jiyanî û aborî li ser me zehmete û ev barê me giran dike. Bazirgan jî li gorî berjewendiyên xwe rewşa heyî bikar tînin û êşa gel berbiçav nagirin. Em hêvî dikin ku guhertinek baş li ser jiyana me pêk bê û dawî li buhabûna kel û pelan bê.”

Mihemûd Alxizlanî

‘Rakirina bacan li ser kel û pelan wê rewşa jiyanî baş bike’

Firoşkar Welîd Zilfo diyar kir ku nirxên kelûpelan ne di destê wan de ye û wiha got: “Buhabûna kel û pelan ne di destê me deye, ji ber ku her seatê nirxê dolar tê guhertin. Em jî li gorî dolar kil û pelên xwe difroşin. Di heman demê de piraniya kel û pelan ji derveyî Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji mer tên û di rê de bac li ser wan tên birîn. Dema ku bac li ser kel û pelan bê rakirin wê nirxên wan kêm bibe, herwiha wê gel jî, ji vê yekê razî bin. Hêviya me jî ew e ku jiyan di hemû aliyên xwe de xweş bibe û gel bi aramî û bê astengiyan jiyan bikin.”

Welîd Zilfo

‘Bazirganên ku bi serê xwe kar bikin ew ê bên cezakirin’

Di heman çarçoveyê de endamê Desteya Pêjiyanîyê ya bajarê Amûdê Mehmûd Ismaîl diyar kir ku bazirgan û firoşkarên ku ne li gorî nirxên dolar kar bikin wê werin cezakirin û wiha got: “Em rewşa bazarê bi giştî dişopînin. Pisgirêka ku kel û pel bi awayekî buha tên firotin, ew e ku rewşa dolar li bazarê ne arame. Herwiha bazirganê ku li cem xwe nirxan bilind û nizim bike, wê bên cezakirin. Ji xwe hêviya me ji gel ê me ew e ku bi me re bibin alîkar. Da ku em bi hev re bazara xwe baş bikin. Lewra dema ku ew bibîn kîjan firoşkar ne li gorî bazarê kar bike, werin gazinên xwe bighînin me, em ê jî li gorî hêviyên wan bin.”

Mehmûd Ismayîl

Fûad Umer: Xebata diplomatîk mafê kurdan li ser asta cîhanî diparêze

Endamê Rêveberiya Diplomasî ya PYD’ê li Ewropayê, Fûad Umer diyar kir ku bi dirêjahiya dîrokê re, dijminên kurdan di warê navnetewî û diplomasî de gelek mijar dixistin xizmeta xwe, kurd jî bê rol bûn û got: “Îro kurd xebata diblomasî dikin, ev xebat jî maf û hebûna gelê kurd li ser asta navnetewî diparêze.”

Hemza Sêvo/ Qamişlo

Kar û xebata diplomasî ji bo her dosiyake sereke ya miletekî li nik meşandina siyaset û rêvebirina civakê xebateke taybet û girîng e, ji bo gelê kurd li Rojavayê Kurdistan û Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî heman tişt e. Têkildarî xebata diplomatîk a ku li Ewrûpayê ji bo piştevaniya Şoreşa 19’ê Tîrmehê tê kirin endamê Rêveberiya Diplomasî ya PYD’ê li Ewrûpayê, Fûad Umer bersiva pirsên Rojnameya me da û naveroka hevpeyvînê wiha bû:

Hûn xebata diplomasî ya ji bo piştgiriya Şoreşa Rojava weke konferansa Parîs, a Miyûnx û hemû çalakiyên din ên ku têne kirin, çawa dinirxînin?

Piştî rûxandina rêjîma Baas û bi hatina rêveberiya HTŞ’ê re, Rêveberiya Xweser, PYD û MSD’ê rewşa awarte ragihand, rewşa Sûriyê û herêma Rêveberiya Xweser kete qonaxeke nû. Lewma jî PYD’ê tevlî Civîna Sosiyal Antrnasonal a navnetewî bû, tê de jî hevserokê PYD’ê Xerîb Hiso û 3 endamên din tevlî bûn. Di wê civînê de PYD’ê axaftinên gelek girîng gotin û bala hemû kesên siyasî yên sosyalîst ên cîhanî kişand, pê re jî hemû kesî rola PYD’ê di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de nas kirin. Li aliyekî din bi destpêkirina şerê li ser gelê Şehba, Tilrifeet, Pira

Qereqozaq û Bendava Tişrînê re, berxwedaniyeke mezin li welat kete dewreyê, ev berxwedanî jî rasterast bandor li kurdên Ewrûpayê jî kir. Ji berxwedaniya gelên Rojava me li Ewrûpayê heyecan girt û her kes kete tevgerê. Siyasetmedar, rewşenbîr, hunermend, partiyên siyasî û hew… ji bo şervan û şoreşa xwe kirin, milet jî li derdora wan li ser piyan bûn. Di serî de me PYD’ê li Ewrûpayê nêzî 20 civînan li dar xist, tê de jî kurd ji her çar parçeyên Kurdistanê amade bûn, ev yek tekez dike ku çiqasî kurd ji hev re dibin piştgir. Ji hêlek din ve jî Konferansa Parîsê hat lidaxistin, tê de yekem car axaftinên girîng û bi sûd ji bo kurdan û QSD’ê hatin dayîn. Ferensa dibîne ku guhertineke cidî di Sûriyê de tê çêkirin û dixwaze careke din rola xwe di sûriyê de bilîze, dibe ku welatên din mîna Almaniya, Îtaliya û hin welatên Ewrûpî jî beşdarbin. Di heman demê de jî Kongreya Miyûnxê jî li Almaniyayê hat lidaxistin, yekem car jî siyasetmedarekî kurd ji Rojavayê Kurdistanê tê de amade bû û rola kurdên Rojava û Şoreşa Rojava di pirosesa aştiya herêmê de anî ser ziman. Ev yek tu caran di dîroka gelê kurd de li ser asta navnetewî derneketiye pêş, lê îro em dibînin ku kurd encamên şoreşê û berxwedaniya ku tê domandin hilgirtin ser milê xwe û xistin rojeva navnetewî, herwiha bûne xwedî roleke mezin di warê diplomatîk de.

Di vê dema heyî de meşandina xebata diplomasî ji bo piştevaniya Şoreşa Rojava çiqasî di warê parastina destkeftiyên kurdan de girîng e?

Di dîrokê de gelê kurd li ser asta Kurdistanî serhildanên bêhempa lidarxistine, lê di warê navnetewî û diplomasî de bi bin ketine, kurd hem bê rol bûn, hem jî destgehên wan ên diblomasî tunebûn. Ji ber vê yekê jî dijminên kurdan bi rêbazên cuda yên ku diket xizmeta wan di warê hevpeyman û civînên diblomasî de li gorî xwe nirxandin dikirin. Nemaze, Peymana Lozanê bi vî rengî bû, nûnerên gelê kurd di Lozanê de tune bûn, ji ber vê yekê jî rola sereke ya Tirkiyê bû, di wê peymanê de kurd ji holê hatin rakirin û Tirkiyê qezenceke mezin wergirt. Piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn û Duyemîn jî kurd ji milê diplomatîk de lawaz bûn, nikarîbûn xebateke diplomatîk bikin. Wekî em dizanin xebata diblomatîk gelekî girîng e ji bo me, ji ber ku bi vî hawî mafê kurdan tê parastin. Eger em bêjin tenê têkoşîn li hundirê welat tê meşandin û dûrî mijara diplomsiyetê bikevin, nabe. Eger kurd li gel berxwedaniya ku tê meşandin, xebata siyasî û diplomatîk nekin, wê demê têkoşîna wan tenê ji bo neyên qirkirin. Rast e berxwedaniya Bendava Tişrînê li nik xebata kurdan a navnetewî ya ku tê kirin gelek guhertin li ser asta navnetewî bi xwe re anîn. Eger têkoşîna Bendava Tişrînê têk çûbaya wê dengeyên siyasî û diplomatîk jî bihata guhertin. Êdî em têdigihêjin ku bi riya xebata siyasî û diplomasî, kurd ne tenê hebûna xwe diparêzin, lê belê mafê xwe jî daxwaz dikin.

Da ku Şoreşa Rojava bi ser bikeve û xebateke diplomatîk bê meşandin erkê kurdên li Ewripayê çi ye?

Ev dema ku Rojavayê Kurdistanê tê re derbas dibe, qonaxeke dîrokî ye, serkeftina beşek, bajarek û aliyekî kurdan bandorê li parçeyên din ên Kurdistanê û destkeftiyên kurdan dike. Herwiha binkeftina hêzek, aliyek û parçeyekî Kurdistanî bandorê li hemû gelê kurd dike. Şoreşa Rojavayê Kurdisatanê ne tenê şoreşeke siyasî û leşkerî ye, lê belê şoreşeke civakî, hunerî û rewşenbîrî ye. Lewma jî divê para hemû kesan di şoreşê de hebe, ji ber ku serkeftina şoreşê tenê bi xebata siyasetmedaran ne têrker e, û bi tena xwe sernakeve, axaftin û nêrîna rewşenbîran, ne weke nêrîna siyasetmedaran e. Li aliyekî din eger îro ew destanên ku li Bendava Tişrînê û berxwedandiya gelên Rojava ji hêla nivîskaran ve belge nebin, wê kî bi vê erkê rabe û kengî. Îroj pêwîst e kurd bi nivîskar, rewşenbîr, hunermen û hwd… li Kurdistanê û derveyî welat piştevaniya Rojava bikin û di vî warî de xwedî rol bin. Gelek kesayetên kurd di saziyên navnetewî yên Ewrûpayê de hene, ne merc e ku ji PYD an MSD û an jî partiyeke din bin, lê ew dikarin xebateke baş ya diplomatîk bidin meşandin û bandoreke mezin bidin avakirin.

‘Wê hemû pêkhate tevlî Komcivîna Sûrî ya Gotûbêja Niştîmanî bibin’

Reşo Mihemed/ Qamişlo

Kurdiyar Dirêî tekez kir ku wê ji tevahiya gelên Sûriyê herwiha pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Siwêda, Deria, Humis, Şam û Hema jî beşdarî komcivînê bibin û got,: “Armanc ji Komcivîna Sûrî ya Gotûbêja Niştîmanî, derketina encamên baş ji bo siberoja Sûriyê ye.

Navenda Rojava ya Lêkolînên Stratejîk(NRLS) bi durşmeya “Komcivîna Sûrî ya Gotûbêja Niştîmanî, ber bi Sûrîyeke Azad, Pirreng û Demokratîk de.” wê komcivînekê di 27’ê Sibatê li Reqayê li dar bixe. Ev civîn wê li ser asta Sûriyê be, tê de jî wê nûnerên hemû pêkhateyan amade bin.

Derbarê lidarxistina vê komcivînê, endamê Komîteya wê ya Amadekar Kurdiyar Dirêî ji rojnameya me re axivî.

‘Wê hemû gelên Sûriyê û kesên bibandor beşdarî komcivînê bibin’

Kurdiyar Dirêî tekez kir ku wê ji tevahiya gelên Sûriyê mîna pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Siwêda, Deria, Humis, Şam û Hema jî beşdarî komcivînê bibin û wiha got: “Komcivîn li ser asta du xalên bingehî bi dirêjahiya rojekê wê were lidarxistin. Xala yekem wê li ser dîroka avakirina Sûriyê be û çawa pêkhateyan rola xwe lîstiye herwiha bi hatina rêjîmê re çawa rêjîm siyaseta dûrixsitinê li ser pêkhatên wê meşandinye. Herwiha xala duyemîn jî wê li ser destûra guncav a ku divabe Sûriyê li ser wê bê avakirin be. Ji ber vê jî em ê komcivînekê di 27’ê vê mehê li dar bixin, li ser asta Sûriyê wê kesên xwedî bandor ku civak wan qebûl dike hem jî nûnertiya hemû pêkhateyên Sûriyê bike, ji Humis, Hema û Laziqiyê beşdar bibin. Di heman demê de wê nûnerên saziyên Rêveberiya Xweser, rewşenbîr, çalakvanên sivîl, ji tevahiya pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê amade bin. Di heman demê de wê kesayetên din ji Ewrûpayê tevlî bibin.”

‘Armanc; derketina encamên baş ji bo siberoja Sûriyê ye’

Endamê Komîteya Amadekar a Komcivîna Sûrî ya Gotûbêja Niştîmanî Kurdiyar Dirêî diyar kir ku armanca wan ew e ku gelên Sûriyê bi hev re bigihêjin encamên baş ji bo pêşeroja Sûriyê û wiha axivî: “Em hemû dizanin ku piştî rûxandina rêjîma Beis û hatina HTŞ’ê li ser desthilatdariya Şamê gelek hevdîtin û diyalog hatin lidarxistin. Piştî ku ev rêjîm çû her kes di tevgerê de bû û pirsiyar dikir ku wê sîstem çawa be. Wekî em dibînin, dewleta Tirk dixwaze dewleteke navendî-islamî û yekreng ava bike. Me di vê dema bûrî de rengê xapandinan dît, nemazeya wê jî civîna ku komîteya amadekar a Kongreya Niştîmaniya Sûrî ji hemû parêzgehên Sûriyê re çêkir. Komîteya Amadekar rewşenbîr, siyasetmedar û hin kesên li gorî xwe û kesayetên bêbandor li Şamê civandin da ku hişmendiya xwe ya li ser bingeha navendbûn û cîhadîstê bipejirîne ji bo Sûriyê. Lê em bi riya vê komcivînê dixwazin nerîna hemû pêkhateyên Sûriyê bigirin û nasbikin ku xwesteka wan ji bo siberoja Sûriyê diyar bikin. Di heman demê de bi riya diyalogê bigihêjin encamên baş û pêşinyarên ji bo bicihkirina sîstemeke demokratîk, nenavendî û wekhev ji Rêveberiya Xweser û hikumeta Şamê ya nû re pêşkêş bikin.”

Ji Efrînê ta Bendava Tişrînê Şervanê heqîqetê; Egîd Roj

Hevrêya şehîd Egîd Roj, rojnamevan Lîlav Elî ku demekê dirêj hevdû nasdikirin, da diyarkirin ku rojnamevan Egîd Roj ji Efrînê û heya Bendava Tişrînê kêliyên berxwedanê belge kir û wiha got: “Egîd Roj, bi kesayeta xwe ve Egîdeke rastiyê afirandibû.”

Argêş Viyan/Qamişlo

Rojnamevan Egîd Roj (Şervan Seydo) ku 5’ê Sibatê 2025’an li Tişrînê di êrîşekê dagirkeriya Tirk ya li dijî gel de şehîd bibû, rêwîtiyeke dur û dirêj ya ku ragihandina denge rastiyê bû meşand. Egîd Roj, êrîşên dewleta Tirk yê dagirkeriyê, berxwedaniya bêhempa ya gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê kêlî bi kêlî ji civakê re ragihand. Ruxmê ku di temenê piçûk de tevlî Tevgera Azadiyê bibû jî astengî nasnedikir û bû şopînerê rêya Gûrbetelî û Xelîl Uysalan.

Derbarê jiyan û kesayeta rojnamevan Egîd Roj yê ku êrîşekê dewleta Tirk ya dagirker de li Bendava Tişrînê şehîd bibû, rêhevala wî û rojnemevan Lîlav Elî ji rojnameya me re axivî.

‘Heval Egîd Roj, hem di kar û hem di jiyana xwe de xwedî felsefeya Apoyî bû’

Rêhevala şehîd Egîd Roj, rojnamevan Lîlav Elî anî li ser ziman ku rêhevalê wan Egîd deng û rengê rastiyê bû û wiha dest bi axaftina xwe kir: “Heval Egîd Roj di sala 2017’an li Efrîna ku ji aliyê dewleta Tirk ya dagirker ve hatiye dagirkirin de, min naskir. Lê wan deman zêde danûstandinên me bi hevre çênebûn. Piştî Efrînê hate dagirkirin, me li kampa koçberan ya bi navê Serdem li Şehba naskirina me zêde bû. Heval Egîd hovîtiya dagirkeriya Tirk ku li Efrînê diqewimîn yêk yêk teqez û belge kir. Di berxwedaniya bihempa ya 58 rojan weke ku kêlî bi kêlî derbas neke ji raya giştî re ragihand. Dema ku nû tevlî Tevgera Azadiyê bû, tevî ku temenê wî ciwan jî bû lê bi paş de gav ne avêt. Bi ruxmê wî di temenê ciwan de jî, dagirkerî şopand û bi cîhanê giştî re derewên dewleta Tirk ya dagirker eşkere kir. Heval Egîd ne tene rojnamevanek bû, di heman demê de dengê civakê bû û ji ber ku ji bajarê Efrînê jî bû êşa gelê herêmê baş nas û hîs dikir. Her tim hewildan dikirin ku bi dîmen be, bi nîvîs û gotinê be jî ev rastiya ku li Efrînê tê jiyankirin hemû cîhanê bide temaşekirin. Rûken bû, di dema çeperan de jiyanê de ev kenê wî hertim berdewam dikir. Heval Egîd astengî û zehmetî nasnedikirin, xwe di oxira şoreşê de feda kirbû. Bi wê keniya xwe jî, ji derdor re jî hêvî dida avakirin. Rêhevalên xwe re kaniya çareserî û hêzê bû. Pirsgirêk û kêmasiyên kîjan hevalî be nîqaş dikir û ji bona çareseriyê çi pêwîst biba pêk di anî. Heval Egîd weke palpiştekê ji bona hevalên xwe bû, bi kar û xebatên xwe bû bîra çapemeniya azad. Di destpêka êrîşên li Bendava Tişrînê, heya kêliyên xwe yên şahadetê jî heval Egîd pir bi israr bû ku karê xwe berdewam bike û rastiyên heyi bi şopîn e. Ruxmê ku pir caran me jê re digot “Heval tu westiyayi were piçekê jî bêhna xwe vek e.” Bersiva heval Egîd ev bû ku “Heya serkeftin teqez nebe ez venagerim.” Pir vekirî û zelal dianî li ser ziman. Ji ber çawa ku hovîtiya dewleta Tirk ya dagirker li Efrînê bibû şahîd, li Bendavê jî hezdikir wê teqez bik e. Hevalê Egîd herdem digot ku Efrîn rizgar bibe, pêkane ku rojekê gele Efrînê vegerin warê xwe azad jiyan bikin, lê ev wan kêliyan divê nebîn e. Kesayetê hevalê Egîd bi felsefeya Apoyî hatibû perwerde kirin sekin nasnedikir.”

‘Şehadet hêz dide dengê çapemeniya azad’

Lîlav Elî bibîrxist ku dewleta Tirk nikare bi êrîşan denge rastiyê bidin sekinandin û wiha berdewam kir: “Hevalekî xwe bi demên dirêj bi hevre kar kiriye me oxir kir, em rêhavalên wî ji me re pir zehmet û bi êş bû. Mirin li rûyê Egîd yê li ken nedihat, ji ber ku xwe di oxira jiyanê de feda kiribû. Ruxmê ku li Bendava Tişrînê nûçegihanê hemû kanal û televizyona hebûn jî, heval Egîd ji bona her saziyên Ragihandina Azad kar dikir. Em ti caran nahêlin ku pênûs û kamireya hevalên me li erde bîminin. Yek Egîd diçe, yek Cîhan diçe hezaran şîn dibin. Barekî mezin rêhevalên xwe re hişt û barê me ji berê girantir bû ye. Bi bilindikirin û xurtkirina karê xwe em soza tolhildana hevalê xwe bidin û em ê bibin dengê rastiyê, dengê Ezîz û Naziman. Hertim rêhevalên xwe bawer bû û digot dê ev rêhê hevaltiyê û fedekariyê serkeftin bi teqez bib e. Em jî wê sozê dubare dikin ku em rêhevalên rastiyan şopînerê Gurbetelî û Egîdan nahêlin ku dengê rastiyê qut bibe û em ê dengê rastiyê bilind bikin.”

‘Dewleta Tirk ya dagirker ku sûckar e di heman demê de hêzên bêdeng jî hevkarin’

Lîlav got ku bêdengî tê wateya hevkariyê û wiha axaftina xwe qedand: “Ev ne cara yekem e ku dewleta Tirk ya dagirker endamên ragihandin û çapemeniyê dike armanca êrîşên xwe. Demekê ku beriya hevalê me Egîd Roj şehîd bikeve, li heman cihê hevalên me yên rojnamevan Nazim û Cîhan hatin şehîd xistin û ne tene li Rojavayê Kurdistanê, li tevahî Kurdistanê dengê rastiyê dike armanca êrîşên xwe yên dagirkeriyê. Gulîstan Tara, Hero Bahadîn û mamosteyê hêja yek ji stûnên çapemeniya azad Ezîz Koyluoglu hatin armanckirin. Ne tenê şehîd xwistinê armanc kirina hevalên me di saziyên aligir yên çapemeniyê û girtinê hewildidin ku rastiya ku tê jiyan kirin ji holê rabike û bi derewên xwe raya giştî bixapîne. Dewleta Tirk ya dagirker di êrîşên xwe de sucdar e, sazî û dezgehên mafên rojnamevan û ragihandinê jî, bi wê bêdengîya xwe ew qas hevkariya wan êrîşan dikin. Li herêmên dagirkirî weke Efrînê jî rojnamevanên ku hewildidin hovîtiya çeteyên dagirker yên herêmê derixin rûyê erdê tên revandin û çarenûsa wan jî hîn ne diyar in. Lê hedef girtina rojnamevanan sucekî dijî mirovahiyê ye û divê dewleta Tirk ya dagirker bê darizandin. Ev êrîşên li ser rojnamevanan êrîşên qirkirina gel û civake kê ye. Em dîsa weke hempîşe û rêhevaleke rojnamevan Egîd Roj bîbirtînim û di şexsê wî de bejna xwe li ber şehîdên ragihandina azad û yên dengê rastiyê ditewînim.”

Li Sûriyê çarserî xweseriye!

Dilyar Cizîrî

Ev zêdeyî 2 mehane rêjîma Baas ku beriya 53 salan destbiladariya Sûriyê di encama derbeya leşkerî de bi dest xist hate ruxandin. Vê rêjîmê di dema desthiladariya xwe de zulim, zordarî û tevliheviya di nava civakê de wekî esasê rêveberiya xwe bikar anî. Civak paş guhkir û li gorî xwe sîstema koletiyê di nava gelê Sûriyê de pêş xistin. Piştî sala 2011’an rêjîma Baas bi zulim û zordarî bi sedhezaran welatiyên Sûriyê yên ji bo guhertina demokratîk serî hildan, kuştin, dan koçberkirin û neçarî birçîbûnê û wêranê kirin.

Ji ber wê ji bi ruxandina rêjîma Baas re hema bêje hemû gelê Sûriyê kêfxweş bûn. Hema bêje her kes bêyî metirsiyên heyî bibîne, bi ketina rêjîma zalim kêfxweş bibe. Di vê navberê de çekdarên Heyet Tehrîr El-Şam ku navê wê yê berê Cebhet El-Nûsra bû hat ser desthiladariya Şamê. Kes ne ket wê ferqê ku rêveberên Sûriyê yên nû hîn li ser lîsteya terorê yên navdewletî ne. Ji rojên destpêkê yên êrîşa wan li dijî Helebê dîmenên kuştin, êşkence û gelek kiryarên dijmirovî hatin weşandin.

Lê ji ber hilweşîna rêjîmê û kêfxweşiya wê êdî kirinên wan di nava rojeva kêfxweşiya ruxandina rêjîma berê de hate windakirin. Di heman demê de mijara vekirina girtîgehên rêjîmê û di serî de ya Sêdnaya lê hema bêje kirin û binpêkirinên endamên wan zêde ji raya giştî ya Sûriyê ve wekî tê xwestin ne hate dîtin.

Rêveberiya Xweser û QSD’ê ku rastî êrîşên dewleta Tirk û çeteyên wê hatin, di nava parastina herêmê û xema parastina sivîlan li Heleb, Şehba û herêmên din de bûn, xebatên parastinê esas girtin. Civaka Bakur û Rojhilatê Sûriyê di wê demê de bi xwediderketina li koçberên Efrîn-Şehbayê û şopandina xeteriyên li derdora xwe rojevên xwe dagirtîbû. Lê niha û piştî zêdeyî 2 meha êdî di serî de xelkê Bakur û Rojhilatê Sûriyê û tevahî gelê Sûriyê bûne guhertinên li Sûriyê pêk hatine, baştir analiz û lêkolîn dikin.

Di encamê de gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo parastina destkeftiyên xwe seferberbûn, Berxwedana Bendava Tişrîn (Bendava Şehîdan) encam da û gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê li ser esasê Şerê Gelê Şoreşger serkeft û hişt dewleta Tirk di wir de bixetime. Lê desthiladariya nû ya Şamê an ku hikûmeta Heyet Tehrîr El-Şam bê navber di nava hewldanan de ye ku desthiladariya xwe di asta avdewletî de rewa bike. Lê ji piratika wan diyar dibe ew ê nikaribin hêvî û daxwazên gelê Sûriyê pêk bînin.

Niha ji kêfxweşiya ruxandina rêjîmê zêdetir êdî gelê Sûriyê bi hemû pêkhateyên xwe li benda guhertinên li ser erdê ne. Lê hikûmeta Heyet Tehrîr El-Şam di piratika xwe de wekî rêjîma berê dixwaze yekrengiyê li ser civaka pir reng feriz bike. Gelê Sûriyê jî van siyasetan qebûl nake.

Ev jî dibe sedem ku gelê Sûriyê li her herêmekê xwe birêxistin bike û li sîstema xwe ya rêveberinê bigere. Jî ber wê jî li Siwêda wekî Bakur û Rojhilatê Sûriyê rêveberiya xweser tê avakirin. Li Dera, Laziqiyê û Tertûs civak di nava lêgerînê de ye. Her kes jî sîstema Rêveberiya Xweser tekane riya çareseriyê dibîne.

Xeteriya Mezin Şerê Taybet e

Rojnamevan Melevan Resûl diyar kir ku Şerê Taybet ê ku niha li Rojavayê Kurdistanê tê meşandin pir dijwar û xeter e. Ji bo li hemberî van lîstokan rê bê girtin, pêwîst e rojnamevan bi qasî berpirsyartiya xwe ya exlaqî û netewî tevbigerin.

Lîloz Hisên/Qamişlo

Dijmin ji bo ku armancên xwe pêk bîne, tevahiya rêbazan bikar tîne, rêbazê herî xernak jî ku herdem dijmin dixe dewrê Şerê Taybet e. Şerê Taybet xwe dispêre hilweşandina nirx û exlaqê civakê û di serî de jin û ciwanan dike hedf.

Di vê dema dawî de li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê dewleta Tirk şerekî taybet bi riya raghadinê û medyaya civakî dide meşandin, da ku herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi giştî bixe bin serweriya xwe, gelek rûpelên girêdayî çeteyên dewleta tirk a dagirker li ser medyaya civakî nûçeyên derewîn belav dikin, bi armanca avakirina fitneyan di navebra pêkhatyên herêmê û şereke navxweyî derxîne, herwiha da ku îrade û pîskolojiya civak û şervanan bişkîne.

Şerê raghadinê

Weke tê zanîn roleke pir giring ya raghandinê di veguherandina dozên girin weke siyasî, civakî û aborî bike raya giştî, herwiha çareseriyeke adil deyne, lê li beramberî wê jî roleke xirab ya rghandinên girêdayî desthlatdar û pergalên hegemonîk heye, ku tenê dikeve xizmeta van pergalan, da ku berê dozan bixin bin berjewendiya wan. Derbarê şerê taybet, rola raghandin û medyaya civakî ser civakê di dema heyî de, rojnamevan Melevan Resûl ji rojnameya me re axivî.

Rojnamevan Melevan Resûl diyar kir ku armanca şerê taybet di riya raghandinê de jihevxistina moralê civak û şervanan e, ku nûçeyên sexte û derewîn belav dikin ev yek dihêle ku banodreke mezin çêbibe. Ji avalên nû yên tên bikaranîn di dema nû de cuda ne, mîna belavkirina gotegotan bi armanca xistina tirsê di nava civakê de mîna tirsasndina ji aliyê leşkerî ve, xurtkirina sîxortiyê ji hêla hin ajanan.”

Rojnameva Melevan Resûl wiha pê de çû:” Dema heyî ya ku zêdetir tê şopandin ji hêla gela ve medyaya civakî ye, bandoreke wêyî mezin heye, lê heta çi astê ew nûçeyên tên belavkirin duriste, bê exlaqiyek tê kirin ji hêla hin aliyan di riya raghandinê, ev alî di malên xwe de ku girêdayî hin pergalên desthilatdarin û şerkî taybet dijî civakê dikin, ne fermîne û ne girêdayî yekîtiya raghandinê ne. her kes xwe dike berpirsyarê saziyekî, leşker û di aliyê siyasî de, ev kes ne cihê baweriyê ne ji ber ku nûçeyên wan 90% ne rastin. Em niha şerekî rahandinê li bakur û rojhilatê Sûriyê jiyan dikin, gel jî dibe qurbaniya van nûçeyên derewîn, agahiyên ne rast tên belav kirin, bi armanca têkbirina rewşa manewî, gelek hemleyên sîstematîk derketin pêş da ku rastiyê hedef bigrin.”

Melevan Resûl wiha domand: “Gelek alî ketin bin vê xapandina şerê taybet, pêşeroja xwe ya siyasî, civakî û malbatê têkbirin, ji ber ku netêghiştineke wan hebû. Şerê taybet ku niha li rojavayê kurdistanê tê bikaranîn pir dijwar û xetere. Hêzên dijber piştî rûxandina rêjîma Baas, ajanên xwe êdî xistin tevgerê. Ji ber şerê taybet yên me digot dostên me, aşkere bû ku dijminekî hovane ye. Pir kes ketin bin bandora şerê taybet û bûn çete, xwe bi arzanî frotin.”

Armanca şerê taybet ku li herêmê tê bikaranîn

Melevan Resûl îşaret kir ku dewleta tirk tevahî şêwaz û alavên şerê taybet û raghandinê li dijî herêma me û giştî sûriyê pêk tîne, bi aramanca berfirehkirina hegemoniya xwe û dagirkirina xakên din ji Sûriyê, bi taybet jî bajarê Kobanê ku sembola berxwedanê tê naskirin, televzyonên xwe bi tevahî kiriye xizmeta daxwaz û berjewendiyên xwe, dezgeh û televzyonên ku gel dişpoînin hedef girtiye û xiste bin bandora şerê taybet, nûçeyên derewîn belav dike û wiha got:” tê diyar kirin ku heta televîzyon û dezgehên raghandinê jî tên xapandin, ji bo têkbirina hestên netewî, tirs di nava gel de bide çêkirin, bi giştî propogandeyek bi vî rengî tê bikar anîn.”

Melevan Resûl detnîşan kir ku ji armancên vî şerî jî ku sîstema netewa demokratîk ku li herêmê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatiye avakirin, pergala ku tevahî pêkhate tê de kom bûne têk bibe. Ji xwe tirsa dewleta tirk e ew ku ev sîstem bê erê kirin li tevahî Ssûriyê, ev yek ne gorî berjewendiyên wê yên dagirkeriyê ye, lewma dixwaze fitneyan û şerkeî navxweyî bide avakirin di navbera tevahî pêkhateyan, di riya bikaranîna şerê taybet. Divê gelê sûriyê ji vê yekê hişyar û zane bin, da ku ev lîstok vala derkeve.

Melevan Resûl di dawî de got:” Li Bakur û Rojhialtê Sûriyê, dezgehên raghandinê heta astekê erkên xwe bi cih anîn, lê têrê nake, divê raghandina me zêdetir kar û xebatê bide meşandin, da ku li hember van êrişan bisekinin. Divê zêdetir hişyar bin ji bo qûnaxa bê. Gerek rojnamevan bi qasî berpirsyartiya xwe ya exlaqî û netewî tevbigerin. Ji xwe weke tê zanîn dema ku raghandina azad dema heqîqetê bişopîne, wê bedelên giran jî bide, mînaka herî dawî ku dewleta tirk du rojnamevên heqîqetê Cîhan Dîlgîn û Nazim Daştan kir hedefa balafirên xwe, dema ku rojnamevan şerê li bendava Tişrîn dişopandin, ji bilî wan jî 30 rojnamevan li Rojavayê Kurdistanê gihaştin asta şehadetê, bûn qurbaniya şerê taybet.”

Li şûna Baas’ê rejîma HTŞ tê avakirin

Zekî Bedran

Li Sûriyê amadekariya kongirekê netewî tê kirin. Ji bona kombûyina Kongirê bê rêxistinkirin desteyek hat ava kirin. Weke ku tê payin piştî kongrê jî dê hikûmetekî nû were damezirandin. Ev kongreya ku behsa wê tê kirin gelo wê bi hevpar û demokratîk be? Kongire navê wê li ser e, di asta navnetewî de pewîste hevpar û nûnertiya tevlîbûneke giştî be. Civîn û kombûnên ku di bin serweriya dorhêleke teng an jî derdorên siyasî de tên kirin, wek kongreyên netewî nayên dîtin. Ev desteya tevlî wê kongirê dibe, bi piştgiriya kîjan aliyan ve hatine hilbijartin? Dê avakirin û vesazîkirina saziyan bi rêyên demokratîk pêk were yan jî dê li ser daxwaza komek an jî hêza ku desthilatdar dê bimeşe? Ev pirs û rê û rêbazên şopandinê pir giring in. Tê gotin Sûriyê ji nûve tê avakirin. Gelo ev pêkhate wê li ser bingeheke pir navendî û otorîter, mîna rejîma Baas be, yan jî demokratîk be? Bingehên ku niha bên avêtin û rêya ku bê şopandin dê pêşeroja Sûriyê diyar bike. Ji ber vê yekê gavên ku bên avêtin divê pir baldar bin, heta ku derfet hebe, nûnertiya gel bikin û li ser bingehê avakirina demokratîk bin. Lê ya ku niha tê kirin tu eleqeya xwe bi avakirina sîstemeke demokratîk re nîne. Desteya ji bo lidarxistina kongreyê ji aliyê HTŞ’ê ve hat diyarkirin. Delegeyên ku dê beşdarî kongreyê bibin ji aliyê gel ve nayên hilbijartin. Weke rejîma Baasê, agahiya raya giştî ji kesên ku li ser wan hatin nîqaşkirin û vexwendin ji bo kongreyê tine ye.

Rejîma Baas jî hilbijartin dikir, lê namzetê parlementeran kîne, ji aliyê gel ve nedihat zanîn. Ji aliyê navendî ve hin kesayet dihatin xuya kirin û digotin hûn weke namzetê parlementeriyê hatine hilbijartin. Rêjeya gel çiqasî çûne li ser sindoqan. Dengê xwe bikaranîne, ne dihate zanîn. Kiryarên ku HTŞ’ê jî dike, ji wan ne cuda ye. Desteya hilbijartinê bixwe dide xuyakirin. Hevkirin û tevlîbûnek girseyi ya civakê tine ye. Deste kê guncav dîtîbe ev weke parlementer tê hilbijartin. Lê, kêm û zêde hêzên ku hatine birêxistîn kirin, sazî û partî hene. Divê bi wan re hevkarî bê kirin û qasî ku bê kirin vîna gel pêwîste di kongrê de bê teyisandin.

Dûrxistina partî û komên rexistinkirî hilbijartinekê bizanbûn e. Ji ber ku HTŞ’ê niyeta avakirina rejimeke demokratîk nîne. Baweriya wê bi demokrasiyê naye. Weke hişmendî jî, ti cudahiya wan bi rêxistînên weke El Kaide re tine ye. Bi vekirî nabêjin em dijî demokrasiyê ne, lê têgeha demokrasiyê jî nayinin li ser zimanê xwe.

Di danezanan de hejmara delegeyên bajarekî ku dê beşdar bibin diyar dike. Rewşenbîr, partî û saziyên wî bajarî di nav xwe de nîqaşan dikin, navên ku tevlî dibin pêşniyar dikin û yên li ser li hev dikin wekî delege tên diyarkirin. Lê, tiştek wisa nayê kirin. Deste diyar dike ku dê ji bajar û herêman çend kes bên vexwendin. Raya giştî nizane dê kî bibe delege û kî were vexwendin. Di vî warî de pêkhateya bi navê kongreya netewî tu şans û hewildana netewîbûnê nîne. Ev di rastiyê de, bi rengekî taybet kongreya HTŞ ye. Ji ber vê yekê rewabûna xwe winda dike û alozî derdikevin holê.

Hikûmet an jî desteya makezagonê ya ku bi kongreyeke ku pirsgirêka rewabûnê heye û bi rêbazên demokratîk nayên diyarkirin wê çiqas rewa be? Destûr wê bi tevahî di bin yekdestdariya HTŞ’ê de bê çêkirin. Hikûmeta nû dê hikûmeta HTŞ’ê be û balkêş e ku Neteweyên Yekbûyî û derdorên din ên peywendîdar li hember vê rewşê bêdeng û xemsar in. Di danûstandinên Destûra Bingehîn ên Cenevreyê de hikûmet, muxalefet û derdorên din tevlîhev bûn. Niha Baas hatiye rûxandin, divê xebat û tevlîbûn hîn berfirehtir û demokratîktir be jî, berovajî wê, avahiyeke hîn tûndirew û yekdestî tê pejirandin. Çawa ku bingeha rejîmekê tê danîn, ew rejîm jî li ser wê bingehê radibe. Bingeha ku niha hatiye avêtin xwedî naverokeke pir dijî demokrasî ye û otorîter e.

Kongre bi rastî jî çêbû û derbasbû. Li Sûriyeyê hawîrdoreke cidî ya nîqaşê nîne. Yên ku bi rastî jî bi Sûriyê re eleqedar dibin jî temaşevan in. Berê ragihandin di destê Baasê de bû. Ew çapemenî niha ketiye destê HTŞ’ê. Lewma jî ragihandin ji kesên xwedî nêrîn û rexneyên cuda re girtî ye. Di demokrasiyan de nîqaş û pêşbaziya nêrînên cuda pêwîste hebe. Dengê gel û bindeştan bi awayekî tê bihîstin. Niha dengê rewşenbîr, bindeştan, Elewî, Xiristiyan, Kurd û komên din nayê bihîstin. Kurd û herêmên xweser ên herî birêxistinkirî ne. Komîteyê silavek jî nedaye van meclîs, rêveberî û partiyan. Ev demokrasî yan jî kongireyeke netewî bi çi awayî ye?

Partî û rêxistin nayên xwestin, beşdarbûn nîne. Tiştê seyr ew e ku rayedarên HTŞ’ê dibêjin, “Her kes wê bighêje mafên xwe.” Ew ê çawa mafên xwe bigirin? Tiştekî bi navê bidestxistina mafan nîne. Lê, maf dê çi be ku HTŞ’ê dide. Her tişt bi tevahî di bin serwerî û xwesteka HTŞ’ê de ye.

HTŞ’ê weke ku li ser tevahiya Sûriyê serdest e tevdigere. Lê tevahiya Sûriyê ne endamên HTŞ’ê ne, komên cuda bawerî, gel û çandên cuda hene. Gelek partî, rêxistin û jin li azadiyê digerin. Ew hewl didin ku van hemîyan pagguh bikin û her tiştî bi HTŞ’ê ve girêbidin. Navnîşana heyî ber bi avakirina rejîmeke tam tûndirew ve tê birin. Rewşenbîrên Sûriyê, yên demokrasiyê dixwazin û yên xwedî nêrînên cuda, pêwîste bi awayekî çalak nîqaşan bikin û tevlî pêvajoyê bibin. Di rewşa heyî de, wisa dixuye ku her tişt li HTŞ’ê re maye.